



Dr. Sozdar Mîdî (E. Xelîl)



wergera ji erebî: Mustefa Reşîd

Tîrêjên Çarşembê

Xelek - 40

Horî: Panorama Navan

Girîngiya Horiyan:

Dîrokzan *René Labat* gotiye: "**Horiyan li ser zînên hespên xwe, bi ben û werîsekî nijadî û çandî Aşûr, Ermîniya, Anatoliya û Sûriya jorîn bi hev va girêdan**"¹.

Ev gotineka pir girînge, lê belê tiştek jê kême; ew jî ewe ku navê Kurdistanê nehatiye gotin. Wek pir dîrokzanên ku li ser dîroka rojavayê Asiyayê nivîsandine, *René Labat* jî hesabê rastiya dîrokî nekiriye. Ji ber ku erdnîgariya ku ew dibêje (Aşûr, Ermîniya, Anatoliya û Sûriya jorîn) ew warê pêşiyên Kurdane. Ji bilê Ermîniya, heya niha jî Kurd li wan herêman dijîn û Kurd li hin herêmên Ermîniya jî dijîn û hin Ermen û padîşahên wan yên pêşîn ji pêşiyên gelê Kurd bûn.

Di pirtûka "*Padişahiya Mîttanî Horî*" da ku di sala 2013an da hatiye çapkirin, me qala Horiyan kiriye (nav, kok û binyat, erdnîgarî û rewşa siyasî), ji ber ku *Mîttanî* şaxek ji Hoririyan bûne û paytextê wan *Washukanni* di erdnîgariya Horiyan da ye (li nêziya bajarê Serê Kaniyê yê niha ye). Lê çiqas em di jêderên dîrokî da berfireh biçin, em hên bêhtir agahdariyan di van babetên jêrîn da dibînin:

- 1 - Girîngiya Horiyan di dîroka neteweya Kurd da.
- 2 - Peywendiya Horiyan bi gelên rojavayê Asiyayê ra.

Di vê lêkolînê da em dixwazin bêhtir giranahiyê bidin mijara navê "*Horiyan*" û li şêwazên vî navî yên cuda hûrbibin. Ev şêwazên cuda encama dengdayîna wan zimanane ku ev nav pê hatiye nivîsandin û şêwazê tîp û nivîsîna ku hatiye bi karanîn; û her wisa encama wergerandina ji zimanekî bo zimanê dine. Ka em gotinên dîrokzanên di vî warî da bînin ber çavan:

Hin Agahdarî û hin jêder:

- Şêwazê navê "*Horiyan*" ku di zimanê kurdî da tê naskirin şêwazê "*Horî*" yan jî "*Ûrî*" ye. Lê şêwazê bêhtir di nivîsên erebî da tê naskirin şêwazê "*Hûrî*" ye. (حُورِي).
- Hin dîrokzanên gotiye ku şêwazê rastîn "*Hur-ri*" (*Xûrî*) (خُورِي) ye û dibêjin ku peywendiya vî navî bi gotiya (*Hurdî* - *Huradî*) ra heye ku di nivîsên horî û ûrartûyî da hatiye û tê maneya (serbazê hişyar, peywan). Hittûtan jêra gotiye (*Hur-lêsh*) û (*Hur-lush*). Ev şêwaz gelemarî ye û yekjimariya wî "*Hur-lu*" ye. Hin şêwaz jî bi awayî (*Hur-du*) û (*Hur-rum*) hene².

- Navê Horiyan di pirtûka Tewratê da bi şêwazê "*Hûrîm*" (حُورِيم) hatiye. Divêt em bêjin ku "îm" di zimanê ibranî da nîşana gelemariyê ye³.
- Navê Horiyan bi şêwazê "*Kur*" jî hatiye ku ji şêwazê "*Hur*" (*xûr*) hatiye guhartin û bi şêwazê "*Kurus*" ku ji "*Huruz*" hatiye guhartin. Dîrokzanê inglîzî *Laurence Austine Waddel* gotiye ku êleka ariyanî bi navê (*panch*) li kenara *çemê Gang* li bakurê Hindistanê li dawîya sedsala 8-an û destpêka sedsala 7-an b.z., û li gel êleka ariyanî din bi navê (*Kur*) yan jî (*Kurus*) serdarî dikir. Vê êla han ji bakurê Sûriyayê û Asiya Bîçûk goçî vê herêmê kiribû⁴.
- *Jean Bottéro* dibêje: Hin destanên sûmerî hene ku çîroka padîşahên serdariya bajarê Ûrûk pêş Galgamêş kirine dibêjin. Di wan destanan da hatiye ku qehremanên wan welatê "*Hurru*" (حُرْم) yê çiyayî talan kirine; û ku "*Hurru*" tê maneya "*welatê Horiyan*"⁵.
- *Laurence Austine Waddel* bawer dike ku navê xwedawendê babilî "*Mar-duk*" di bîngê da ji navê xwedawendê rojê yê sûmerî hatiye. Yek ji navên wî yên bi sûmerî "*Har*" yan "*harri*" bû, yanê "têkoşer, şervan". Laurence bawer dike ku navê xwedawendê misirî "*Hor*" (*Horus* bi zimanê yûnanî) ji navê sûmerî "*Har*" yan "*harri*" hatiye wergirtin. Yan jî ji sûmerî ji navê "*Sur*" yan jî "*As's'ur*" xwedayê rojê hatiye wergirtin. Di zimanê Sansakrît da "*Sura*" yan "*Asura*" dihate gotin, û di farisiya kevin da "*Hor*" yan jî "*Ahûra*" dihate gotin. Divêt em zanibin ku tîpa "S" di sansakrîtî û sûmerî da, di farisiya kevin da dibe "H". Mebest ji farisiya kevin, zimanê ariyanî yê kevine⁶.
- Misiriyên kevin ji beşekî Sûriyayê ra û ji erdê "*Ken'an*" (كَنْعَانَ) (Filestîn û Îsraîla niha) ra digotin erdê "*Xarû*" yan jî "*Xûrû*"⁷.
- Ji zimanê "*horî*" (*xûrî*) ra digotin zimanê "*karî*". Zaniyar *Flaikovski* dibêje: Mebest ji zimanê "*xar*" zimanê "*karî*" bi xwe ye, yê ku di wêjevaniya kevin da tê bi navkirin. Bi zimanê misirî ji Derya Navîn (Derya Sipî) ra digotin "*Derya Kar*" yan jî "*Derya Xar*" li gor Horiyan⁸.
- Seyid Mahmud Al-Qimni dibêje: Cara here kevin ku îşaret bi zimanê "*karî*" hatiye kirin di nivîsên dîrokzanê yûnanî Strabo da hatiye. Zimanê "*karî*" wek zimanekî nenas yê gelekî nenas demeka dirêj ma, di pêra di nivîsên şaristaniyên kevin da hin nîşan hatin dîtin ku zimanê "*karî*" zimanê "*xûrî*" (*horî*) ye. Di girê Al-Amarne da li Misirê nameyekê ji 600 rêz bi zimanê "*kar*" hate dîtin ku padîşahê Mîttanî "*Dushratta*" (*Tushratta* li dor sala 1360 b.z. serdarî kiriye) ji Fer'ewn *Amenhotep III* (1405 - 1367 b.z.) bavê Fer'ewn *Akhenaten* ra şandiye⁹.
- Xwedawend "*Asura*", xwedawend "*Ahûra*" be xwe ye. Ew li Mîttaniyan bi şêwazê "*Asûr*" dihate naskirin û li ba *Kaşşîyan* jî bi şêwazê "*Suryaş*". Ev hemû şêwaz ji navê rojê "*sûr*, *hûr*, *xûr*" di zaravayên ariyanî rojhilatî da hatine. Di nivîsên akkadî da tîpa "s" bûye "ş" û bi şêwazê "*Aşûr*" li cihê "*Asûr*" hatiye nivîsandin.

Hin encamên dawî:

Ji peyvên derbasbûyî em van encamên jêrîn werdigirin:

1 - Navên (*hûr*, *xûr*, *xûrz*, *xar*, *xarû*, *sûr*, *kar*, *kûr*, *kûrz*, *hûr*, *hor*, *har*, *harî*, ...) hemû ji bo nîşankirina gelekî taybet ku gelê *horî* ye hatine gotin.

2 - Ji van navan hemiyan dawereka nijadî-neteweyî taybet bi gelê *horî* heye, û dawereka ayînî taybet bi rojê û ayîna rojeyî heye. Di tara vê dawera ayînî da navê "*xwedayê rojê*" yan jî "*Xweda Roj*": *Hor*, *Hûr*, *Hûra*, *Ahûra*, *Sûr*, *Sûra*, *Asûr*, *Aşûr*" peyda bûye.

3 - Navê "*Horiyan*" (*Hûriyan*) bi hemû şêwazên xwe pir kevine; ew vedigere heyama sûmerî di hezarsala sêhem b.z. da û zorbeya beşên Kurdistanê digirte nav xwe.

4 - Baweriyên ayînî rojeyî (şemsanî) di civatên pêşiyên Kurdan da serdar bûn.

Niha jî li pêş me ma ku em navê "*Horî, Hûrî*" bi şêwazên xwe yên cuda di kelepura kurdistanî da bişopînin.

Evê mijara me ya dahatî be.

Çarşemb, 30.12.2015

Jêder

¹ René Labat û hinên din: Zincîra efsaneyên sûrî, rûpel 8.

² Gernot Wilhelm: Horî, rûpel 17. Cemal Raşîd Ehmed: Xuyakirina Kurdan di dîrokê da, 1/606. Ebduleziz Saleh: Rojhilata Nêzîk ya kevin (misir û Îraq), rûpel 561.

³ Gernot Wilhelm: Horî, rûpel 17.

⁴ Laurence Austine Waddel. Bingehên sûmerî yên şaristaniya misirî, rûpel 274-275.

⁵ Gean Bottéro û hinên din: Rojhilata Nêzîk, Şaristaniyên Destpêkî, rûpel 77-78.

⁶ Laurence Austine Waddel. Bingehên sûmerî yên şaristaniya misirî, rûpel 268-269.

⁷ Flaikovski: Heyamin di tevliheviyê da, 219, Abraham Malmat, Hayim Tadmur: Ibranî û Benu Israîl, rûpel 83.

⁸ Flaikovski: Heyamin di tevliheviyê da, rûpel 220.

⁹ Seyid El-Qimni: Pêximber Mûsa û rojên dawî yên Til Amarne, C 2, rûpel 259.